Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 935 | 23-Çille - 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني

# Erkmen: Çîrok giyanê civakê ne

**Çîrokbêj Ayhan Erkmen got çîrok dibin sedem ku bîr û bîreweriya civakî zindî bimîne.**

Ayhan Erkmen sala 1973'an li navçeya Dîgorê ya Qersê, li bajarokê Pazarcixê hatiye dinê. Piştî ku Fakulteya Hiqûqê diqedîne çar salan li Qers navendê parêzerî dike. Erkmen li Pazarcixê dibe şaredar û sala 2011'an dema ku şaredarî dikir hate girtin.

Ayhan Erkmen ê ku ji mêj ve ye li ser çîrokan dixebite û hem niviskî, hem devkî par ve dike, li ser fikra bê ka fikra çîrokbêjiya wî ji kû derketiye got ,''Min çîrok nivîsîbûn û min ê bi rengê pirtûkê ew çap bikirana lê bi min pir karîger xuya kir ku li torên parvekirina civakî vî karî par ve bikim. Ji bo ku xwe vebêjim platformek bû. Mirov ji xwendinê bêhtir ev dişopandin. Li ser vê, min jî li ser youtubeyê dest bi vegotina çîrokên xwe kir. Piştî demekê dema ku bala mirovan kişand vê ez motîve kirim. Bi vî rengî min dest bi çîrokbêjiyê kir.''



Erken diyar kir di bernameyên çîrokbêjiya wî de gelek ciwan hazir dibin, peywendîdar in, pirsan dikin, bi wî re têkilî datînin û ev jî hêviya wî geş dike û got, ''Ji vî alî ve li ser paşeroja çîrokbêjiyê hêvîdar im. Belê bi sedan dengbêjên me hne û distrînni lê çîrokbêjên me kêm in. Divê em wan jî zêde bikin.''

Derheqê têkiliya çîrokbêjî û dengbêjiyê Erkmen got, ''Her dengbêj çîrokbêj e lê her çîrokbêj ne dengbêj e. Çîrokbêj tenê bi çîroka xwe dizane, strana wê nizane. Herduyan tim hev xurt kirine. Dengbêjekî ku ketî ber karîgeriya çîroka çîrokbêj strana wê çêkiriye. Çîrokeke dramatîk a Siyo û Zelêxa hebû ku van demên dawî min bihîstibû û nivîsîbû û vegotibû. Piştî ku min ew çîrok par ve kir dengbêj Apê Zahir strana wê çêkir. Ji ber vê mirov dikare bibêje navbeyna du çandan tim danûstandinek heye.''

Erkmen bi bîr xist li nav hemû civakan wêjeya devkî heye, hin gel zûtir bûne xwedî derfet ku vê derbasî nivîsê bikin û got, ''Wan wêjeya devkî beriya Kurdan kişandine lê ji ber bêdewletiya gelê me, rengê jiyana wan, belkî ji ber ku perwerde pir berbelav nebû, ew çanda devkî, zû negihaşte nivîsê. Dengbêj û çîrokbêj ji vî alî ve bi roleke mezin rabûne.''

Derheqê çîrokbêjî û bîra civakî jî Erkmen got, ''Dibe sedem ku bîr û bîreweriya civakî zindî bimîne. Çîrok, stran giyanê civakê ne. Civak bi wî giyanî hilmê dide û distîne.''


Derheqê çîrokê û dîrokê de çîrokbêj Ayhan Erkmen got, ''Her çîrok xwedî paşxanekî dîrokî ye. Ji berhevkirina çîrokên pir klasîk bêhtir jiyînên vê sedsala dawî dikim çîrok. Dema ku van dikim çîrok jî, ji bilî ya ku ji min re hatî vegotin, her wiha li ser dîrokê jî dixwînim. Ango her du kirasan bi hev re lê dikim. ''

Erkmen li çîroka dîtina çîrokên xwe jî got destpêkê ew bi pey çîrokan diket lê van demên dawî êdî mirov çîrokan digihînin ber destê wî. Erkmen got, ''Ji çar aliyê cîhanê ve çîrokan ji min re dişînin. Ango dengê mezinên xwe, rojnivîskên ku mezinên wan nivîsîbûn digihînin ber destê min. Vê carinan bi devkî, carinan niviskî dişînin.''

Erkmen herî dawî zext û zordariya serdestan a li ser Kurdan bi bîr xist û got ,''Zext û zordariyên serweran kiriye ku dîroka devkî, çandî devkî, wêjeya devkî li nav Kurdan zêdetir berbelav û xurtir be.''

***ANF***

# 2021 bû yek ji salên herî germ yên heft salan



**Rêxistina Meteoroliyê ya Cîhanê (WMO) ragihand ku 2021 bû yek ji heft salên herî germ.**

WMO ku saziyeke Neteweyên Yekbûyî ye û navenda wê li Cenevreyê ye, bi daxuyaniyekê got, "Ji sala 2015'an û vir ve salên herî germ ên heft salan, 2016, 2019 û 2020 e."

WMO'yê diyar kir ku heft sal in li ser hev germahiya hewayê li gorî serdema beriya pîşesaziyê bi 1 pileyî zêde ye û got, "Ji ber gaza sera ya li atmosferê ku di asta rekorê de ye, tê payin ku germahiya global û meylên guhertina avhewayê yên demdirêj ên din dewam bikin."

Sekreterê Giştî yê WMO'yê Peterrî Taalas got, "Ji ber gaza serayê ya zêdebuyî, germahiya global a ji ber faktorên avhewayê û germahiya global a demdirêj, guherina salane ya germahiya global gelekî zêde ye."

Li gorî WMO'yê sala 2021'ê yek ji salên herî germ e û li gorî serdema beriya pîşesaziyê ya navbera salên 1850-1900'î de bi 1.11 pileyî germahî zêde bûye.

Li gorî daxuyaniyê, bi germahiya 50 pileyî ya li Kanadayê, sala 2021'ê wê di bîra mirovand e bimîne.

***ANF***


## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Amade | Çêkirî, sazkirî, durist, hazir: Xwarin amade ye. Ez di civînê de amade bûm. |
| Civak | Komek mirov ya bi hev re li welatekî, yan bajarekî, yan gundekî dijî û xwediya hin taybetiyên hevbeş: Gelê Kurd civakeke kevnar e. |
| Çand | Urf û adetên di nava demê de ji civakekê re bûyîn exlaq. Tore, kelepûr, kultûr: Di çanda Kurdan de mêvanperwerî pir xurt e. |
| Derfet | Delîve, fersend, kes, mecal, imkan... Derfet çênebû bixwînim. |
| Desthilat/desthilatdar | Kes, yan jî kesên hêza siyasî, yan leşkerî, ya welatekî yan herêmekê di dest de. Rayedar, karbidest, serdar, serdest: Li Kurdistanê biyanî desthilatdar in. |
| Navend | 1.Nîvê derekê, cihê girîng: Ez çûm dikaneke li navenda bajêr. 2. Bingeh, ciyê agahî lê kom dibin û jê belav dibin: Ez çûm navenda saziyê. |
| Pêwîst | Tişta pêdivî pê heyî, divê. Ji bo yekîtiyê pêwîst e em tiştekê bikin. |
| Saye | Bi saya wî ez baş bûm. Bi xêra wî, dewlet serê wî. Di farisî de jî bi heman wateyê heye. Tirk jî bi kar tînin. |
| Şano | Zarvekirin, berhema tiyatroyê, berhema zarvekirinê ya lîstikvan pêşkêş dikin. |
| Şoreş | 1.Avêtina hikumetê ji desthilatdariyê. 2.Têkoşîna dûrxistina hikumetê ji desthilatdariyê. 3.Guhertinên bingehî. 4.Peydabûna tişkeke berê nedîtî. |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | O | | I | | A | D | A | R |
| 2 | Î | | E | L | Î | F | | A | |
| 3 | R | O | M | A | | E | Ç | | Z |
| 4 | | N | | M | A | T | | X | E |
| 5 | A | S | A | | R | | M | I | R |
| 6 | E | | T | A | Z | Î | | M | |
| 7 | | J | Î | | E | | F | Î | L |
| 8 | J | I | N | E | B | Î | | R | A |
| 9 | Ê | | A | W | A | | R | E | |

### Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Yezdanekî misrî... Serbest, ne kole
2. Notayek... Kurteya elementa hesin... Boyaxa neynokan
3. Kurtebêja Ksenonê
4. Alava ku pê rîs tê ristin
5. Li hin cihan beramberî heşt û li hin cihan jî beramberî şazdeh olçekan e... Plakaya navneteweyî ya Sûriyê
6. Paytexta Yewnanistanê
7. Dews, tiştê ku li dû xwe hin rêçan dihêle... Notayeke mûzîkê... Agir
8. Demên rojê... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin
9. Bizina kûvî... Edalet

**JOR-JÊR**

1. Genimê hêrayî... Ji bo qewirandina heywanên mîna mirîşk û qazan
2. Ji wî/ji wê... Beşeke malê, jûr
3. Paytexta Bolîvyayê
4. Felaket, karesat... Peyva neyînî
5. Herfa pêşî ya elîfbaya erebî
6. Kar û xebat... Xwarina sereke
7. Jimarên du, çar, şeş, heşt û hwd.... Pêxemberek... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin
8. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Beyreq, sembola welatan
9. Peyveke teşwîqkirinê... Postê gurandî

## ` Her ku min li paş xwe dinêrî dûman û agir bi ser bajarê min diket`

Zeyneb Qenber: Di binê topên dagîrkeran de me berê xwe dida ciyekî aram. Her ku min li paş xwe dinêrî dûman û agir bi ser bajarê min diket. Ew agir di dilê min de jî geş dibû û êşa min girantir dibû. Hê dipirsim û li bersivê digerim, gelo çima evqas kîn, sûc, kuştin û hovitî! ***R-2***




Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 935 | 23-Çille - 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Êrişên ser Şingalê bi armanca qirkirina civaka Êzîdî tên kirin

Hediya Şemo: "Civaka Êzîdî koka gelê Kurd e û Şingal jî remzeke dîrokî û pîroz e. Ji ber wê parastina wê erkê her Kurdê xwedîşeref û xwedîxîret e." ***R-5***



# DAGÎRKIRINA EFRÎNÊ BINPÊKIRINA NIRXÊN MIROVAYIYÊ BÛ





## Dewleta tirkî kujera paşrojê ye

Di her êrişê de yên dibin gorî zarok û walatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê ne. Sûcdar û kujer jî dagîrkeriya dewleta tirkî ye. Sûcê dawî wijdana tevayiya mirovayiyê hejand. ***R-5***




## `Berxwedan û têkoşîn erkê me ye`

Hunermend Danîş Botan: Çîroka hunermendiya min ji zindanê dest pê kir û heta niha jî dewam dike. ***R-7***



## Rêveberiya Xweser bi vekirina projeyan ji ambargoyê re dibe bersiv

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi vekirina projeyên aborî, hewldana şkandina ambargoya li ser herêmê dike. Herwiha rê li pêşiya keybaziya bazirganan û bilindkirina bihayê pêdiviyan digire. ***R-6***



## Efrîn dîrokeke ji berxwedanê ye

Berxwedana Efrînê ya li hemberî dagîrkeran ji 1920'an ve dest pê kiriye. Hêzên Fransî li Efrînê rûbirûyî berxwedana yekê ya li Sûriyê dimînin. Miho Îbo Şaşo guleya yekê li hemberî dagî-rkeriya Fransa li ser asta Sûriyê li Efrînê teqand. Niha jî gelê Efrînê li hemberî dagîrkeriya tirkî têdikoşe.. ***R-4***

**Têkoşîna PKK'ê ya zimanê kurdî**
Farûk Sakik R-4

**Bila hîcar bi Efrînkî be**
Idrîs Henan R-5

**Wêjeya jinê**
Gulal Kasanî R-7

# ` Her ku min li paş xwe dinêrî dûman û agir bi ser bajarê min diket`

**Zeyneb Qenber: Di binê topên dagîrkeran de me berê xwe dida ciyekî aram. Her ku min li paş xwe dinêrî dûman û agir bi ser bajarê min diket. Ew agir di dilê min de jî geş dibû û êşa min girantir dibû. Hê dipirsim û li bersivê digerim, gelo çima evqas kîn, sûc, kuştin û hovitî!**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Li ser salvegera çaran ya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên ser Efrînê şahida êrişan û endama Rêveber ya Bûroya Jinê (Navenda Efrîn) li Şehbayê Zeyneb Qenber serhatiyên gel yên biêş û bûyerên di berxwedanê de ji rojnameya me re vegotin.

Zeyneb bixwe ji gundê Mûsako yê navçeya Raco ya Efrînê ye, lê li bajarê Minbicê mezin bûye. Ji ber kiryarên çeteyên DAIŞ'ê vedigere bajarê Efrînê û li gundê dapîr û bapîran xwe bi cî dibe.

**`Gelo ma bersiva mirovayiyê wiha tê dayîn!`**

Zeyneb piştî çar salan bîranînên xwe vedibêje û hê li bersiva bêpirsa xwe digere. "Min qet bawer nedikir ku gelekî aştîxwaz û herêmeke ewle ku qet zirar nedaye kesekî, bi vî rengê dirinde û hovane bibe amanca êrişan. Lewra ne wijdan, ne exlaq û ne jî mejî vê tehemûl dike. Tirkiyê di êrişan de ne bi tena serê xwe bû, NATO û dewletên din jî pê re hevkar bûn. Lêbelê tevî wê jî gelê Efrînê biryara berxwedanê da. Lê çima evqas kîn, sûc, kuştin û hovitî?! Ji destpêka şoreşê ve asta herî jor ya mirovî û pîvanên exlaqî, me pêk dianîn. Me bi sedhezaran koçber li Efrînê dihewandin. Ma bersiva mirovayiyê wiha tê dayîn? Gelek pirs di mejiyê min de hene. Çima em tên kuştin? Kesên bi fobiya Kurdan ketîn (dewleta tirkî) zarokekî yek-du mehî jî ji bo xwe xeter dibînin. Heta zarok jî di çavên van êrişkaran de terorîst bûn û diviya bên kuştin!"

**`Xeman nexwin çand roj in emê vegerin`**

Bi dijwarbûna êrşên ser Raco û gundewrê wê, Zeyneb tevî malabata xwe berê xwe didin Bajarê Efrînê û wan kêliyan wiha vedibêje: "Ji ber mirina mirovayiyê û li hemberî vê bêdengiya cîhanê, me ji neçarî biryar da ku ji Efrînê derkevin. Tê bîra min biraziya min xatirê xwe ji leyzokên xwe xwest û ji wan re got, `xeman nexwin, çavê we li malê be, çand rojên din em vedigerin`."

**`Berxwedan, helwesteke dîrokî û erkekî mirovî bû`**

Bajarê Efrînê bûbû navenda Berxwedana Serdemê. Ji her alî ve şandeyên gelên berxwedêr ji bo piştgiriyê berê xwe didan vê qiblegehê.

Zeyneb li ser 58 rojên Berxwedana Serdemê wiha axivî: "Tevî 9 malbatan em li xaniyekî li nava bajêr bi cî bûn. Li malê derveyî bavê min ti kes nedima. Lewra her kes di berxwedanê de xwedîrol bû. Jixwe bavê min li malê, koçber, mêvan û şande pêşwazî dikirin. Wê demê li Efrînê berxwedan, israr, girêdana bi erdê ve û piştgiriya şervanan di asta herî jor de bû. Ji bo şoreşê, gel û şehîdan ev helwesteke dîrokî û berpirsyariyeke mirovî bû. Şervan li çeperên berxwedanê bûn, dayîkan jî bi meş û çalakiyan piştgiriya wan dikir. Di nava êrişên qirkirinê de çalakiyên dayîkan û Efrîniyan didomiyan. Ev berxwedana bûka Kurdistanê ye. 24 saetên 58 rojan bi vî rengî derbas dibûn. Lê dagîrker û çeteyên wê ne mirovayî, ne exlaq û ne jî zagon nas dikirin. Êrişkarên hov li hemberî zarok, jin, pîr, xweza, lawir, dar û keviran bi çekên qedexekirî êriş dikirin û welatê me talan dikirin."



**Rêwitî û bûyerên biêş**

Piştî berxwedana 58 rojan Zeyneb û malbata xwe ji Efrînê derdikevin û rêwitiya wan dest pê dike. Li ser vê Zeyneb wiha dibêje: "Ji neçarî em derketin. Lê ti carî me bawer nedikir qutbûna ji Efrînê û koçberî wiha dûvdirêj bibe. Li ser piyan, di binê baran û topên dagîrkeran de me berê xwe dida ciyekî aram. Her ku min li paş xwe dinêrî dûman û agir bi ser bajarê min diket. Ew agir di dilê min de jî geş dibû û êşa min girantir dibû. Bi rojan em li çolê raketin, bûyerên biêş li ber çavên me rû didan. Me gelek termên mirovên ji qehra mirîn, li paş xwe hêlan. Di wê rêwitiyê de zarok ji tirs, seqem û birçîbûnê diqîriyan û êşa dilê dayîkan bi rondikan dibarî ser rûyê zarokên wan. Her ku em ji Efrînê dûr diketin, dilê me pirtir dilerizî. Ma wê çawa bûya? Me bîranînên, xak û dîroka xwe li pişt xwe dihêlan..!"




**'Tirkiyê DAIŞ`a têkçûyî, zindî kir û pê êrişî Efrînê kir'**

Zeyneb herwiha faktorên hevbeş yên çeteyên DAIŞ`ê û çeteyên ser Tirkiyê anîn ziman û got, ez bûme şahida her du komên çeteyan. Min hem DAIŞ li Minbicê dît û hem dewleta dagîrker û çeteyên wê li Efrîn dîtin. Teşe, rêbaz û çanda êrişkarên Efrînê û DAIŞê ji hev ne cuda bûn. Her du jî sûcdar in, kujer in, talanker in. Bi çanda hovîtî û roxandinê tev digerin. Jixwe çeteyên DAIŞ'ê jî, ji aliyê Tirkiyê ve hatine çêkirin û her du jî xwediyên dîrokeke qirêj ya xwînrijandin û qirkirina gelan in.

**'Divê cîhan berpirsiyariya xwe ya mirovî pêk bîne '**

Li ser berxwedana niha jî Zeynebê wiha got: "Di qonaxa duduyan ya Berxwedana Serdemê de gelê Efrînê li Şehba xwe jinûve bi rêxistin kir û xetên vegera warê xwe bi têkoşînê xêz dike. Ji ber wê dagîrkeran, kêliyekê em bê êrişan nehiştin. Ji aliyekî ve top û gef in, ji aliyê din ve dorpêçkirin e. Ev peyamên zelal in û armanca wan şkandina vîna gel e. Lewra gel çareseriyê di rizgarkirina xaka xwe de dibîne. Cîhan tev dizane ku yên niha li Efrînî dagîrker in. Em xwediyên maf, ax û dîrokê xwe ne. Dixwazin bi domandina sûcan û bi guhertina demografîk taybetmendiyên Efrînê yên kurdî ji kokê rakin. Lê bi derbasbûna 4 salan li ser bîranînên biêş û dûrbûna ji Efrînê, emê bi berxwedan û têkoşînê bersiva dagîrkeran bidin. Herwiha em bang li cîhanê dikin ku berpirsyariya xwe ya dîrokî li hemberî mirovan û mirovayiyê bi cih bîne."








# `Berxwedan û têkoşîn erkê me ye`

**Hunermend Danîş Botan: Çîroka hunermendiya min ji zindanê dest pê kir û heta niha jî dewam dike.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Danîş Botan sala 1973`yan li bajarê Qamişlo di nava malbateke welatparêz de ji dayîk dibe. Dema dibe 18 salî dikeve zindana rejima Sûrî û sê salan di zindanê de dimîne. Sala 1992yan dema ku ji zindanê derdikeve tevlî kar û xebata hunerê dibe û heta niha jî bi hunera xwe ve girêdayî ye.

**Çima dikeve zindanê?**

Danîş heta refa 12`an xwendinê dike. Dema 18 salî ye di dibistanê de xwestiye stiraneke bi kurdî bêje lê mamosteyê wî qebûl nake. Wê demê Danîş û çend hevalên xwe ji mamosteyên dibistanê re dibêjin, ma Kurdan çi kiriye heta ku hûn nehêlin bi zimanê xwe stiranekê bêjin!

Ne li dibistanan tenê tenê li deverên din jî zordarî li Kurdan dihat kirin. Wê demê rejima Sûrî nedihişt Kurd bi zimanê xwe jî biaxivin.

Danîş derbarê ketina xwe ya zindanê de wiha got: "Dema ku mamoste nehişt bi kurdî bistirînim ez pir xemgîn bûm. Wê demê ez ciwan bûm û pir dilgerim bûm. Ev bûyer di dilê min de bû weke birînekê. Ji bo wê jî min û hevalên xwe me çalakiyek li dar xist û me ala kesk û sor û zer li ser banê dibastanê û li çend deverên din hilda. Piştî vê çalekiyê rejimê em xistin zindanê. Heskirina min li hember hûnerê hebû, lê dema ketim zindanê hezkirina min pirtir bû. Ji bo wê jî çîroka hunertiya min ji zindanê dest pê kir. Di zindanê de min dest bi karê hunerê kir û fêrî dengbêjiyê bûm."

**Di zindanê de rêbazê rejima Be's**

Dema ku Danîş di zindanê de dimîne, rejim bi şêwazekî dermirovî û bêaxlaq nêzî wî dibe. Bi rojan bêxwarin dihêle û gelek caran ji sibehan heta êvaran çavên wî girtî dihêlin û curbecur şêwazên işkencê bi kar tînin. Danîş da zanîn ku gelek êş û zehmetî di zindanê de kişandine û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Hin caran dema ku xwarin didian me, mazot yan benzîn dixistin navê. Ji bilî wê rojane lêdan û işkence hebû. Ya herî zehmet ew bû dema ku çar mehan li zindanê di cihekî yekkesî de mam. Min sê salên xwe yên li zindanê bi vî rengî derbas kirin."

**Tevlîbûna Danîş ya Koma Botan**

Sala 1994`an piştî ku Danîş ji zindanê derdikeve tevlî Koma Botan dibe û heta niha jî di nava komê de cih digire. Danîş li ser kar û xebata xwe ya di nava komê de wiha got: "28 sal in di koma Botan de kar dikim. Min nêzî 350 heta 400 berhemî çêkirine. Tevayiya wan helbest û stiran in. Stiran jî Piraniya wan şoreşgerî ne, lê hin caran yên folklorî jî dibêjim. Jixwe stirana yekê ku min bi dengê xwe saz kir `Gula Min` bû."



Danîş ji bilî karê komê gelek caran tevlî çalakî, mihrîcan, bîranîna Hunermendan û festîvalan jî dibe. Dema ku yekîtiya Hunermendên Cizîrê ava dibe, wek hunermend cihê xwe di yekîtiyê de jî digire. Piştî wê tevlî Ofîsa Desteya Çandê dibe û wek cîgirê desteyê tê hilbijartin.



Hunermend Danîş Botan di dawiya axaftina xwe de got, wek hunermendên bakur û rojhilatê Sûriyê emê hewl bidin ku hunera xwe hê zêdetir pêş bixin û hunermendên nifşê nû fêr bikin û bighînin. Herwiha têkoşîna azadiyê dewam bidomînin, lewra berxwedan û têkoşîn erkê me ye.

# Kesên diçin serdana Girê Mirazan gelek in

**Girê Mirazan yê li Xirabreşkê yê li Rihayê, yek ji cihên despêka mirovayiyê ye.**

Girê Mirazan yê li Xirabreşkê yê li Rihayê, yek ji cihên despêka mirovahiyê ye. Par kesên ku çûn serdana vê devera destpêka civaka şên a mirovahiyê, bi hejmara xwe rekor şikandine. Perestgeha li Girê mirazan weke yekê ji yekem perestgehên mirovahiyê tê zanîn; (yên din jî li derdora wê ne). UNESCO'yê ev perestgeh weke mîrateyeke cîhanê diyar kiriye. Par (2021) 567 hezar 453 kes çûne serdana Girê Mirazan. Li gel ku her pênc mehên pêşî girtîbûye jî di mehên din de pirr zêde kes çûne vî cihê dîrokî.



Di sala 2018'an de 70 hezar kes, di sala 2019'an de 412 hezar kes çûbûn ziyareta Girê Mirazan. Di sala 2020'an de ji ber pandemiyê pirraniya beşên wê hatibûn girtin. Ji ber vê yekê 197 hezar kes çûn Girê Mirazan.

Di sala 2021'ê de li gel ku pênc mehên pêşî girtî jî bû, bi hejimara zêde ya serdêran, Girê Mirazan rekor şikand. Rêveberên lêkolînê û yên parastina mîrateyê dibêjin, di salên pêş de wê hejmara serdêrên zêdetir bibe.

***Ozgûr Polîtîka***

# Li Amedê wê 'Kargeha Çîrokê' were lidarxistin

**Wêjegeh Amed vê carê "Kargeha Çîrokê" li dar dixe. Kargeh 5 hefteyan wê bidome. Yên bixwazin dikarin serlêdana xwe bikin.**

Wêjegeh Amed ku li Amedê çalakiyên wêjeyî li dar dixe vê carê li ser çîrokê kargehek (atolyeyek) li dar dixe. Kargeha Wêjegeh Amedê bi sernavê "Li Derve" wê li dar bikeve. Nivîskar Sîdar Jîr wê kargehê bi rê ve bibe û dersê bide. Kargeha Çîrokê pênc hefteyan wê bidome.

Li gor bernameyê vê mehê 23 û 30'ê mehê û meha pêşiya me 6, 15 û 27'ê sibatê dê kargeh li dar bikeve. Saeta li dar ketina kargehê di navbera 14.00-16.00'an de ye.

Wêjegeh Amedê dibêje "Di kargehê de armanc ew e ku beşdar çîrokeke tematîk binivîsin" û banga serlêdana ji bo kargehê dike.

***MA***




# Pirtûkên nivîskarên di girtîgehê de hatin imzekirin




**PEN'a Kurd, Komeleya Nivîskarên Mezopotamyayê û Komeleya Wêjekarên Kurd li Mêrdînê ji bo nivîskarên girtî roja imzeyê li dar xistin.**

**Hunermend Taşdogan: 'Xem Neke' diyarî wê berxwedanê ye**

Hunermend Kasim Taşdogan ku bi stranên "Rê" û "Xem Neke" hat nasîn, diyar kir ku ew strana "Xem Neke" diyarî malbata Şenyaşar dikin û dixwaze ew her tim li cem êş û kêfxweşiya xelkê xwe be. Taşdogan, got ku wê zextên li ser çand, huner û zimanê kurdî jî negihîjin mexseda xwe û bi hêvî ye ku wê kurd bi ser bikevin.

***MA***

## Wêjeya jinê



**GULAL KASANÎ**

Ji mêj ve nêrîneke ne rewa li ser nijada jinê heye. Di dirêjayiya dîrokê de nêrîn û heta bîrdoziyan jî nirxandina wan ji rola jinê re ne saxlem e.

Feylsofê Yewnanî Arîstoteles li ser mijara jinê wiha dibêje: Jin ew jêdera astengî û hilweşandina di cîhanê de ye. Ew mîna darekê ye. Pelên wê jehrî ne. Ji aliyê derve ve bedew e, lê dema çivîk ji dixwin dimirin.

Vê nerînê bi kûrayî xwe berdaye nava raman û hizrên ronakbîr û heta oldaran jî. Lê jin jî ji aliyê xwe ve ranewstiyaye, di her alî de çi civakî, çi siyasî, çi leşkerî û heta wêjeyî her li ber xwe daye.

Nivîskarên jin li welatên Rojava heta Ewropî heta demekê nikarîbûn bi navê xwe berhem û nivîsandinên xwe belav bikin.

Di çerxa 15`an de, nivîskara Ingilîz Marî An Êvans li ser navê Jorij Êliyot berhemên xwe belav kirin. Ji hingê ve ji bo nivîsandinê û diyarkirina hestên xwe hin bi hin cegerî li nik jinê çêdibe.

Di sala 1813`an de nivîsakar Jên Ostên berhema xwe ya bi navê 'Mezinahî û Vîn' belav dike. Di wê berhmê de li ser jiyana jina Ewropî û bi taybetî li ser zewaca di civaka wan welatan de axiviye.

Rola jina Kurd di wêjeyê de çi bû, bi taybetî di demên ku li nik Ewropiyan qedexe bû.

Di çerxa 18`an de helbestvan û dîrokzana Kurd Mestûra Erdelan ya ji bajarê Sine yê rojhilatê Kurdistanê hebû. Helbestvan Mestûre li derdora 2000 malikên helbestî nivîsandine û pirtûkeke wê ya li ser dîrokê jî heye. Li ser dîroka Mîrşahîtiya Erdelan diaxive. Berhema wê ya helbestî di sala 1926`an de ji aliyê zanyarê Kurd Yehya Me`rîfet ve hatiye çapkirin. Lê pirtûka wê ya bi navê 'Dîroka Erdelan' di sala 1990`î de li Moskowa hatiye çapkirin.

Dema mirov bîne hemberî hev, tê xuyakirin ku jina Kurd di demeke zûtir de kariye rola xwe ya wêjeyî bilîze. Ev çi wateyê dide? Xuya ye ku çivaka Kurd ne weke civakên din bûye, rêya wê berferihtir bûye. Mestûre ne helbestvan û nivîskar tenê bû, di aliyê rêveberiya mîrşahîtiyê de jî rola wê habû.

Di serdema nûjen de û piştî van pêşketinên ku çêbûne, rola jinê xorttir bûye, lê tevî wê jî gelek ji nivîskaran li dijî wêjeya jinê radiwestin û dibêjin nabe bi ti awayî wêje were dabeşkirin, wêje wêje ye. Xalis Misewer, Subhî Ehmed, Lema alî û Mizgîn ji wan nivîskaran in.

Wêjeya jinê, ew e ku deqên wê yên afrînerî bi doz û kêşeya jinê ve girêdayî ne. Ew wêjeya ku parastina mafê jinê dike; li dijî stem û zora di dirêjayiya dîrokê de çibûyî -şêwazên oldarî, civakî û siyasî li ser stûyê jinê hatine çespandin- li ber xwe dide. Hin bawerî hene dibêjin ew nayê wê wateyê ku lazime nivîskar jin be, belko mêr be jî.

Li rojavayê Kurdistanê piraniya nivîskaran ne bi wê yekê re ne, ew nerîna ji bo dabeşkirina wêjeyê; di navbera wêjeya jinê û wêjeya mêr de.

Li welatên Ereban jî hê zarawa wêjeya jinê di navbera pejirandin û redkirinê de ye.

Hin nivîskar jî dibêjin, wêjeya jinê wêjeya girêdayî mêbûnê ve ye, ango wêjeya afretî.

Gelo wê di paşrojê de wêjeya jinê bibe jîwar yan na?

# Rêveberiya Xweser bi vekirina projeyan ji ambargoyê re dibe bersiv

**Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi vekirina projeyên aborî, hewldana şkandina ambargoya li ser herêmê dike. Herwiha rê li pêşiya keybaziya bazirganan û bilindkirina bihayê pêdiviyan digire.**



Ji destpêka Şoreşa Rojava û damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk ve herêm bi hemû rêbazan dîplomatîk, siyasî û aborî bi ambargoyê re rû bi rû ye. Armanc ji vê yekê modela Rêveberiya Xweser têk bibin.
PDK`ê 16-19`ê Kanûna par bi bihaneyên bêbingeh deriyên sînor ên Pêşxabûr û El-Welîd ku herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Başûrê Kurdistanê ve girê dide, girtin. Li aliyekî din jî Hezîrana 2021`ê deriyê Til Koçer bi vetoya Çînê-Rûsyayê hate girtin.
Di demekê de ku ambargo li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye ferzkirin, hevserokê Desteya Aborî û Çandiniyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Selman Barûdo, li ser bandorên ambargoyê ji ANHA`yê re axivî û got: "Berdewamkirina ambargoyê li ser herêmên me, ne tenê ji aliyê aborî ve, lê ji aliyê mirovî jî ku encamên xirab derdixe holê."

**RÊVEBERIYA XWESER JI BO RAKIRINA AMBARGOYÊ DI NAVA HEWLDANAN DE YE**

Barûdo diyar kir ku Rêveberiya Xweser kedeke mezin daye û dide da ku civata navneteweyî destekê bide û vê ambargoya rake, her wiha deriyê Til Koçer jî veke ji ber ku damara Bakur û Rojhilatê



Sûriyê ye.
Ruxmî ambargoya li ser herêmên navborî, lê Rêveberiya Xweser di dirêjahiya salên aloziya Sûriyê de karî herêmên xwe îdare bike, di heman demê de li gorî derfetên heyî berhemên herêmî pêşxistin.
Li herêmê çandinî jêdereke sereke ya debarê ye, nexasim genim, ceh û pempo ji ber ku erda herêmê kêhatî ye û atmosfera wê jî guncaw e, li aliyekî din jî herêm bi sewalkarî û petrola xwe tê naskirin ku wekî girîngtirîn madeyên sereke yên avakirina pîşeyan e.

**XWEÎDAREKIRIN**

Rêveberiya Xweser bi armanca îdarekirina herêmên xwe, gelek kargeh vekirin da ku berhemên herêmî pêşbixe û kirîna madeyan ji derve kêm bike.
Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca destekdayîna sewalkaran, gelek proje vekirin, ji wan:
- Rêveberiya Giştî ya Çandinî û Berhemên Sewaldariyê 22'ê Gulana 2021'an hêkvekirin (Mefqes) vekir da ku hewcedariya bazarên herêmê, ji hêk û goş bi cih bîne. Bi vê projeyê kar ji gelek ciwanan hate peydakirin û bi xwediyên mirîşkan re bû alîkar ku berhemên wan zêde bibin.
Li gorî rêveberê projeyê Ebdulqadir Hoban, hilberînên hêkvekirinê li derdora hezar û 500 çewlikên mirîşkan ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê têne belavkirin. Ev proje mehane derdora 120 hezar hêk û derdora 100 hezar çêçik çêdike.
Hoban îşaret pê kir ku di demekê de deriyên sînor ên bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê re girtîne, ev proje girîng in û rê li pêşiya keysbaziya bazirganan girt.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cotmeha par kargeha (my sun) a pakkirina avê li navçeya Tirbespiyê vekir. Alavên pêşketî û nû li vê kargehê hatin bikaranîn û baş dixebite, li aliyekî din jî şûşeyên mezin û biçûk çêkirin.
Endamê Rêveberiya Kargeha "my sun" a avê Eyûb Hesen berî niha ji ajansê re wiha axivîbû: "Ev kargeh girîng e, hewcedariyên bazarê ji avê peyda dike û derfetên kar peyda dike."
Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser 30`ê Gulana 2021`ê li herêma Dêrikê, kargeha Penêr û Mast vekir û rojane 4 ton şîr dimeye, di encamê de destekê dide sewalkariyê û rê li pêşiya bêkariyê digire.
Li Qamişloyê 26`ê Çileya 2021`ê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê yekemîn kargeha zeyt, rûn û sabûnê vekir. Kargeh rojane 300 ton derdixe.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 5`ê Kanûna par li bajarê Hesekê kargeha Takstîlê vekir.
Têkildarî mekanîzmeya pêşxistina projeyên aborî yên li herêmê, hevserokê Desteya Aborî û Çandiniyê Selman Barûdo axivî û got: "Pêşxistina projeyan dê bi rêya hilanîna madeyên xam, berfirehkirina rûbera çandiniyê û girêdana hilberînên çandiniyê bi berhemên pîşesaziyê re pêk were da ku saktoreke giştî çêbibe."
Barûdo îşaret bi siyaseta xweîdarkirinê kir û got, yek ji stratejiyên aborî yên ku Rêveberiya Xweser xwe dispêrê ye, ji ber ku kirîna madeyan ji derve kêm dike û hilberînên herêmî pêş dixe.
Projeyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, rê li pêşiya bêkariyê digire, kirîna madeyan ji derve kêm dike, hilberînên herêmî pêşdixe û welatiyan teşwîqî xwedîkirina sewalan û berfirehkirina qada çandiniyê dike.
***ANHA***

# Civînên gel bênavber didomin

**Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ya Herêma Cizîrê civînên bi gel re didomîne. Civîna çaran ya li ser asta kantona Hesekê li navçeya Şedadê hate lidarxistin.**



Di çarçoveya rêzecivînên girseyî ku Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê li bajarok û bajarên wê li dar dixe de, li Hesekê civîna 4'an ji welatiyên herêma başûr hate lidarxistin. Civîn li hola Şaredariya Gel a Şedadê ji hêla Meclisa Rêveber a herêma Cizîrê ve hate organîzekirin.
Di civînê de bi dehan şêniyên bajarok û gundên herêma başûr, hevserokên komîn û meclisên herêmê amade bûn. Her wiha Hevserokê Meclisa Kantona Hesekê Xebat Silêman, Hevseroka Gerînendetiya Çandiniyê ya Hesekê Ehmed Yûnis, Hevseroka Komîteya Jîngeh û Şaredariyan a Hesekê Macîde Emîn û Hevseroka Desteya Karûbarên Civakî Hindirîn Sîno amade bûn.
Hevseroka Komîteya Jîngeh û Şaredariyan a Hesekê Macîde Emîn rapora salane ya Rêveberiya Xweser a herêma Cizîrê, bûdceya sala borî, bûdceya îsal û xebatên rêveberiyê yên ji xizmetguzarî, vekirina proje û kargehên li herêmê, xwendin.
Di civînê de nirxandina li ser rapora salane hate kirin, rexne li ser kêmaziyên xizmetguzarî ji herêma başûr re têkildarî şaredarî, perwerde û tuneduristî hatin kirin.
Şêniyan bang li Rêveberiya Xweser kir bi lez komîteyên ji bo têkoşîna li dijî gendeliyê ava bikin û hilbijartinan li dar bixin û got, guhartin yek ji çareserkirina aloziyan e û ya herî girîng jî pêşketina wê ye.
Girêdayî vê yekê welatiyê bi navê Ebdulqadir Şaban da zanîn ku mîna van civînan derfet dide şêniyan ku nêrînên xwe parve bikin û rexne bikin, her wiha bi yek destî bi Rêveberiya Xweser re ne ku çareyên sereke bibînin da ku civakeke rasteqîn ava bikin û li hember ambargoyê bisekinin.
Şabab diyar kir ku divê nûnerên Rêveberiya Xweser li gorî tiştên di van civînan de hatine pêşkêşkirin çareyên ji bo pêşketina rewşa herêmê bibînin.
Derbarê rexneyên şênî, pêşniyar û xwestekan de, Hevserokê Meclisa Kantona Hesekê Xebat Silêman wiha got: "Armanc ji van civînan li azarên şênî, rexne û pêşniyarên wan guhdar bikin. Çewtiyên salên borî derbas bikin û planên ji bo pêşxistina rewşa herêmê deynin."
Silêman wiha domand: "Rêveberiya Xweser dê li gorî derfetên heyî di demeke zûtir de pirsgirêk asê çareser bike, di serî de jî belavkirina mazota sobeyan, başkirina kalîteya nan û piştevaniya çandiniyê."
Silêman behsa xwestekên şêniyan kir û wiha dawî li gotina xwe anî: "Xwestekên şêniyan heta asteke mezin di cih de ne û dê xebat li ser vê yekê were kirin ku kêmasî werin derbaskirin. Dê çewtî û kêmasiyên li herêmê derketine, bi dayîna plan û stratejiyeke nû ya 2022'yan werin çareserkirin."
***ANHA***

# `Daxwaziya min derketina dagîrkeran û vegera gund e`

Kefa Ibeyîd ya ji gundê Şêx Elî ji ber topbarana dewleta tirkî koç dibe û li gundê Til Şinan bi cih dibe. Dema çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker gundê Til Şinan didin ber topan, ji lingê xwe birîndar dibe û ev 5 meh in li erdê ye nikare bimeşe. Kefa dibêje ji bilî vegera gundê xwe û derketina dagîrkeran ji welatê me titekî naxwazim.
Di encama êrîşên dewleta tirkî ya dagîrker ya ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê, de gelek sivîlên bêguneh hatin kuştin û bi sedhezaran koçber bûn ku yek ji wan jî Kefa Ibeyid e.
Kefa wiha behsa rêwîtiya koçberiyê û birîndariya xwe dike: "Piştî ku em gundê xwe Şêx Elî koç bûn, em li gundê Til Şinan di konan de tevî pez û çêleka xwe bi cih bûn. Rojekê em rûniştî bûn, hew me dît ku top wekî baranê bi ser me de dibarin. Me pez û çêleka xwe girtin û em di nava zeviyan de reviyan. Ji tirsa topan me nizanibû em ber bi kû ve diçin. Di dema ku min çêleka xwe direvand, parçeyekî topê li lingê min ket û ez birîndar bûm. Şervanên gund ez rakirim nexweşxanyê û derman kirin. Paşê bijîşkan lingê min emeliyat kir û hesin xistinê û ev 5 meh in li erdê me, nikarim bimeşim.
Kefa da zanîn ku niha di konekî de dijîn û serma zirarê dide hestiyên lingê wê û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Me çend pezên xwe firotin û bi wan pereyan



konek kirî û niha lê dijîn. Zivistana îsal pir dijwar e, sobe me germ nake û bi taybetî piştî ku emeliyat bûm û hesinê lingê min derxistin. Malên me yên bi xwêdana eniyan çêkirîn, di kêliyekê de her tişt li ber çavên me çû."
Kefa da xuyakirin ku derveyî vegera mala xwe û derketina dewleta tirkî tiştekî naxwazin û wiha axivî: "Ma ev rewşa ku em tê de ne jiyan e? Ne mirov, çêlek û ne jî pez cihekî wê heye. Herî kêm li mala xwe em dizanin ku emê çawa bikin û cihê mirovan ji yê lawiran jî cuda ye, ne wekî niha. Em tenê vegera mala xwe dixwazin. Eger cihê pez yê saxlem jî mabe emê lê bijîn lê ya girîng ew e ku em li ser axa xwe bin."
Kefa axaftina xwe wiha qedand: "Eger em nih biçin gundê xwe wê dagîrker me bikujin. Wê bi top û çekên giran me topbaran bikin. Roja ku ez vegerim gundê xwe, ezê dest bi paqijkirina mala xwe bikim, sererast bikim û herî kêm em ê rehet bêtirs razin. Derveyî vegera malê û derketina dagîrkeran ji xaka me, ti daxwaziyên min nînin."
***Çavkanî: ANHA***



# Bi dehhezaran Efrînî: Emê berxwedanê xurt bikin û dagîrkeriyê têk bibin

**Bi dirûşma "Emê Berxwedana Serdemê xurt bikin û dagîrkeriyê têk bibin" Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê bi pêmana salvegera 4'an ya êrişên dagîrkirinê yên ser Efrînê li navçeya Şêrawayê meşeke girseyî li dar xist.**

Bi dehhezaran welatiyên herêma Efrînê li ser rêya M5 a di navbera Heleb û Efrînê de kom bûn û dest bi meşê kirin.
Meş li kampa Vegerê ya li gundê Ziyaretê yê navçeya Şêrawayê sekinî. Piştî deqeyeke rêzgirtin, bi navê Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê, Reşîd Silêman axivî û got: "Berxwedana şêniyên Efrînê ya 58 rojî ya li hemberî teknîka pêşketî û çekên qedexekirî planên duyemîn mezintirîn artêşa dewleteke di NATO'yê de têk bir ku digot ew ê di nava 3 rojan de Efrîn dagir bike."
Paşê hevseroka Meclisa Rêveber a Herêma Efrînê Şîraz Hemo jî got: "Berxwedana dîrokî bi tîpên zêrîn hate nivîsandin ku planên dagirkeriya Tirk ên tunekirina gelê Kurd û şikandina berxwedana wan guhertin."
Şîraz Hemo bal kişand ser rewşa beriya dagirkirina Efrînê û ev tişt anî ziman ,"Jiyana hevbeş, birêvebirina civakê ji aliyê jinan ve, ewlehiya li Efrînê li xweşiya dewleta Tirk nehat, ji ber vê yekê hewl dide gelê Kurd li Efrîn û tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê tune bike."
Paşê bi navê Meclisa Kantona Şehbayê Mihemed Adil axivî û berxwedana koçberan a li kampan û malên kavilkirî, silav kir û got, ruxmî zehmetiyan berxwedana gelan garantiya rizgarkirina Efrînê ji artêşa Tirk û çeteyên wê ye.
Mihemed Adil diyar kir ku kiryarên dewleta Tirk li dijî welatiyan pêk tîne, beriya wê jî çeteyên DAIŞ`ê li dijî gelê sûrî, nexasim Kurd pêk anî.
Mihemed Adil di dawiyê de li dijî



planên dagirker ên li hemû xaka Sûriyê soza berxwedanê da.
***ANHA***

# Li Minbicê çeteyekî DAIŞ'ê hat girtin

**Yekîneyên Antî Teror ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi hevkariya Hêzên Ewlekariya Hundir, DAIŞ'iyek girtin û miqdareke çek û cebilxaneyan desteser kirin.**

Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê têkildarî operasona Yekîneyên Antî Terorê li dijî çeteyekî DAIŞ`ê, daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin: "Piştî xebata şopandinê ya bi hevkariya saziyên ewlekariyê yên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, Yekîneyên Antî Teror ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê, operasyonek li dijî endamekî şaneyeke çeteyên rêxistina DAIŞ`ê ya terorîstî pêk



hat. Navê çete, Ehmed Hesen ji gundê Medne Kebîr ku bi navê Sûfyan tê naskirin. Terorîst Ehmed 12'ê Çileya 2022`an êrişî welatiyekî kir ku erka xwe ya pasdariya saziya Sewalkariyê pê dikanî.
19`ê Çileya 2022'an de piştî komkirina agahiyan, Yekîneyên Antî Terorî girtin ser mala ku terorîst xwe lê vedişart a li gundê Medeya Mezin a li rojavayê bajarê Minbicê. Tevî bangên yekitiyê li terorîst ku xwe radest bike, lê terorîst gule berdan û bi Yekîneyên Antî Terorê re şer kir. Di encamê de terorîst hate kuştin.
Li aliyekî din jî miqdareke çek jî bi dest xistin ku ew jî ev in:
-3 Kalaşnîkof, her wiha çeka Kalaşnîkof ku dema gule reşand ji destên welatî girt.
-3 şûr
-9 cercurên Kalaşnîkof
-Çeka bombekşin
-Guleyên Kalaşnîkof
-Miqdarek ji madeya TNT
- 1 kemçe
-1 mask."
***ANHA***

# HPG: Em şehîdên Xakurkê bi rêzdarî bîr tînin

**HPG'ê gerîlayên ku sala 2016'an li Xakurkê şehîd bûn bîr anînû got, em soza xwe dubare dikin ku wezîfeya şoreşê ya ku wan radestî me kirine teqez bi ser bixînin."**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî 5 gerîlayên li Xakurkê şehîd bûn daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin:
"Dewleta Tirkan ya qirker bi piştgiriya NATO'yê sala 2016'an heta jê hat êrişî Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê kir û xwest Kurdan qir bike. Li dijî van êrişên li derveyî mirovahiyê yên dijminê qirker, Gerîlayên Kurdistanê bi îradeya Apoyî şer kirin û ev êriş pûç kirin, xewn û xeyalên pûç ên dagirkeran têk birin. Di vê têkoşînê de ku her kêliya xwe bi berxwedanê hate hûnandin, hevrêyên me Ronahî, Rizgar, Agît, Xeyrî û Mazlûm cihê xwe di dîroka lehengiyê ya Kurdistanê de girtin. Em van hevrêyên xwe bi rêzdarî bi bîr tînin û soza xwe dubare dikin ku wezîfeya şoreşê ya ku wan radestî me kirine teqez bi ser bixînin.
Agahiyên li ser nasnameya hevrêyên me yên şehîd bûne wiha ne:
Nasnav: Ronahî Gap
Nav paşnav: Cemîl Ecer



Cihê jidayikbûnê: Mêrdîn
Dayik-Bav: Hatîce-Mehmet Şerîf
Dem û cihê şehadetê: 5'ê Gulana 2016 / Xakurkê
Nasnav: Rizgar Colemêrg
Nav paşnav: Star Tekçe
Cihê jidayikbûnê: Colemêrg
Dayik-Bav: Esmer-Nacî
Dem û cihê şehadetê: 8'ê Nîsana 2016 / Xakurkê
Nasnav: Agît Gelaz
Nav paşnav: Halîl Ronken
Cihê jidayikbûnê: Ûrmiye
Dayik-Bav: Sûweyla-Eshed
Dem û cihê şehadetê: 13'ê Tebaxa 2016 / Xakurkê
Nasnav. Xeyrî Serhed
Nav paşnav: Hayrî Gezer
Cihê jidayikbûnê: Wan
Dayik-Bav: Antîka-Cemîl
Dem û cihê şehadetê: 28'ê Tebaxa 2016 / Xakurkê
Nasnav: Mazlûm Elbak
Nav paşnav: Vedat Yilmaz
Cihê jidayikbûnê: Wan
Dayik-Bav: Sezzade-Zulmat
Dem û cihê şehadetê: 22'ê Îlona 2016 / Xakurkê
***ANF***

# Li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo Efrînê çalakî hatin lidarxistin

**Bi rasthatina salvegera 4`an ya destpêkirina êrişên ser Efrînê li Qamişlo, Kobanê, Minbic, Tebqa û Til Birakê meşên girsey li dar ketin.**

Bi rasthatina salvegera 4`an a destpêkirina êrişên dewleta Tirkan a dagirker li dijî Efrînê şêniyên Kobanê meşiyan.
Meş ji Qada Jina Azad destpê kir û li Qada Aştiyê rawestî û veguherî mitîngê. Di mitîngê de endama Koordînasyona Kongra Star a kantona Kobanê Sultane Efrîn axivî û got: "Divê dewletên cîhanê li hember bûyer û sûcên domdar ên li Efrînê pêk tên, xwedî helwestên cidî bin."
Sultane Efrîn berxwedana şêniyên Efrînê ya li hember dewleta Tirk a dagirker silav kir û ev diyar kir: "Berxwedana li Kobanê dê bibe rêya rizgarkirina Efrînê û herêmên dagirkirî."
Di mitîngê de hevserokê Meclisa Navçeya Sirînê Mihemed Selman axivî û piştrast kir ku gelê herêmê piştgiriya gelê Efrînê û herêmên dagirkirî dikin."

**MINBIC**

Meşa li Minbicê bi tevlêbûna bi sedan welatiyan ji çerxerêya Mîzan destpê kir û li kolana El-Wadî rawestî.
Di meşê de hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihemed Xêr Şêxo axivî û got dagirkeran bi armanca tunekirina giyana demokratiyê li herêmê êrişî Efrînê kir.
Berdevkê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş axivî û got: Meclisa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) dê berxwedana xwe temam bikin heta ku axa dagirkirî bi temamî rizgar bikin.

**TEBQA**

Bi sedan şêniyên bajarê Tebqayê xwepêşandanek li dar xist. Xwepêşandan ji çerxerêya El-Hadirî destpê kir û li Nivîsgeha Kombûna Jinan a Zenûbya rawestî.
Piştre Meclisa Sivîl a Tebqayê daxuyaniyek da. Hevserokatiya meclisê Sêvîn Hemo daxuyanî xwend. Di daxuyaniyê de êrişên dewleta Tirk ên li ser Efrînê hatin şermezarkirin.
Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku Efrîn xwe komên tundraw parast û zêdetirî 300 hezar koçberên ji deverên din revîne hemêz kir.

**TIL BIRAK**

Şêniyên navçeya Til Brakê bi pêmana salvegera 4an ya destpêkirina êrişên li ser Efrînê meşek li dar xist. Meş ji rojavayê navçeya Til Brakê dest pê kir û li çerxerêya Şehîdan rawestî.
Hevseroka Meclisa navçeya Til Brakê, Emîne Xilêf hovîtiya dewleta Tirk a dagirker şermezar kir û got: "Pêvajoyên guhertina demografiyê, koçberkirina gelê Efrînê, tirkkirina herêmê û talankirina milk û şûnwaran, berdewamiya hovîtiya DAIŞ'ê ye."

**QAMIŞLO**

Şêniyên Efrînê yên li Qamişloyê dimînin, şêniyên Qamişloyê, endamên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Kongra Star, Tevgera Komûnîst a Şoreşger û Kombenda Efrîn a Civakî tevlî meşa şermezarkirina êrişa li ser Efrînê bûn.
Meş ji kolana Mûnîr Hebîb a li bajêr dest pê kir û li pêşiya avahiya Neteweyên Yekbûyî (NY) rawestiya. Li pêşiya avahiyê endama Rêveberiya Nivîsgeha Jinan a Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) û şêniya ji Efrînê Daliya Menan axivî û diyar kirin ku êrişên sala 2018`an li ser Efrîn pêk hatine, êrişên dagirkirinê bûn. Armanca wan êrişan hedefgirtina nasname û hevgirtina gelan li Efrînê bû, ev yek jî bi alîkariya hêzên navneteweyî pêk hat.
Di mitîngê de Kombenda Efrîn a Civakî daxuyaniyek da. Endama Kombendê Emîna Mihemed daxuyanî xwend.
Di daxuyaniyê de hat diyar kirin ku beriya dagirkirina Efrîn, şêniyên wê di bin sîwana Rêveberiya Xweser de bi awayekî hevgirtî û aştiyan e dijî. Rêveberiya Xweser a ku di nava xwe de hemû pêkhateyan dihewand, ev rewş li kêfa hikumeta AKP`ê nehat lewra bi hiceta avakirina herêmeke ewle şerekî qirêj li dijî xelkê Efrînê destpê kir.
Meş bi slogana "Bijî Berxwedana Efrînê" bi dawî bû.

**REQA**

Bi hezaran şêniyên Reqayê ji Qada Îtfaîyê (Agirkujê) dest bi meşê kir. Welatiyên pankartên "Na ji dagirkeriya Tirk re", "Bi berxwedana gelê xwe em ê Efrînê rizgar bikin" û wêneyên şehêdên Berxwedana Serdemê hildbûn.
Bi navê Meclisa Gel a Reqayê Malik El-Herîr axivî, êrişên li ser Efrînê û sûcên ku li dijî şêniyên wê têne kirin, şermezar kir. El-Herîrî diyar kir ku planên mêtîngeriyê yên dewleta




Tirk a dagirker ji her kesî re eşkere ne.
Hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan a Reqayê Şemis Salih jî axivî, soza şopandina xeta şehîdan da û got: "Em ji Erdogan û çeteyên wî re çogê danayînin."
Bi navê Meclisa Leşkerî ya Reqayê, fermandar Feysel Salim êrişên li ser Efrînê şermezar kir û wiha got: "Em deyndarê xwîna ciwanên Efrînê ya li ser xaka Reqayê û soza me vî deynî vegerîin."
Salim her wiha got: "Em ê Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, tevahî herêmên ku ji aliyê Tirkiyê û çeteyên wê ve hatine dagirkirin rizgar bikin, bi ked û xwîna şehîdan em ê biserkevin."
***ANHA***

# Efrîn dîrokeke ji berxwedanê ye

Berxwedana Efrînê ya li hemberî dagîrkeran ji 1920'an ve dest pê kiriye. Hêzên Fransî li Efrînê rûbirûyî berxwedana yekê ya li Sûriyê dimînin. Miho Îbo Şaşo guleya yekê li hemberî dagirkeriya Fransa li ser asta Sûriyê li Efrînê teqand. Niha jî gelê Efrînê li hemberî dagîrkeriya tirkî têdikoşe.

**Idrîs Henan-Şehba**

Efrîn welatê aram yê biratiya gelan bi bênakokiyên xwe yên etnîkî, olî û rêolî li ser asta Sûriyê cihekî kêmdîtî bû. Qibleya kesên ji agirê aloziyê direviyan û bi merdiya xwe ya bi navûdeng malvaniya penaberên Sûriyê dikir. Sûriyeya piçûk, ango Efrîn bi van xisletên xwe yên ji axê girtîn, tevî zext û rûpîvana teng ya cografîk ji milyonekî zêdetir xelkên Sûriyê himbêz dikirin.

### Guleya yekê li dijî dagîrkirina -Sûriyê li Efrînê hat teqandin

Hêzên Hevbendiyê sala 1918'an tevahî wîlayeta Helebê heya Dîlok û Meraşê dagir dikin. Piştî salekê hêzên Fransayê wîlayeta Helebê teslîm dibin û ji herdu aliyên Mîdan Ekbes û gundê Hemamê ve derbasî "Kurdaxê" dibin. Li stasyona gundê Qitmê jî bargeha sereke ava dikin. Hêzên Fransî li Efrînê rûbirûyî yekemîn berxwedana li Sûriyê dimînin. Miho Îbo Şaşo yekem guleya li hemberî dagirkeriya Fransa li ser asta Sûriyê li Efrînê teqand. Bi vê gavê re jî li gelek herêmên Efrînê berxwedana li hemberî dagirkeriya Fransa dest pê kir.

Salên 1920'an komîteyek Tirk û Fransî sînorên Tirkiyê-Sûriyê xêz dikin. Herêmên Cûmê, Şiyê, Amka, Bilbil, Şikak,…hwd li aliyê Fransa li Sûriyê dimînin. Gelê Efrînê parçekirina Kurdistanê red dirin û dirabin ser piyan.

Fransa têgihaşt ku nikare li "Çiyayê Kurmênc" bi zorê bimîne. Ji lewra berê xwe da fêlbaziyan û piştî sal û nîvekê ji berxwedanê li gorî itîfaqekê derbasî herêmê dibe. Yek ji xalên lihevkirina bi rûspiyên herêmê re ew bû ku li gorî biryara 33 ya 4 Îlona 1922'an, herêma "Çiyayê Kurmênc" were avakirin. 1936'an Fransa xwest weke Iskenderon li Efrînê jî "Sinciqa Çiyayê Kurmênc" ava bike, lê ji ber kêm baweriya bi Fransa re û nakokiyên li ser desthilatdariyê ew proje têk çû.

### Hatine Partiya Be's

Kurd bi hemû hêza xwe beşdarî tevgerên niştimanî yên Sûriyê bûn û li hemberî dagirkerî û parçekirina axa Sûriyê xwedî helwestên hişk bûn. Sekna Kurdan ya li dijî dagîrkerîya Fransa ya berxwedêr û niştimanî, rê li ber destdirêjî û tadeyên sîstema Baas ya nijadperest negirt.

Bi darbeya Hafîz Esed a sala 1970'î û pêşketinên paralel re diyar bû ku bi hişmendiyeke netewperest a teng pêngavekî plankirî li dijî Kurdan tê amadekirin. Bi biryara 36 a 12'ê Tebaxa 1971'an siyaseta erebkirina navên gund, navçe û bajarên Kurdan li Cizîr, Kobanê û Efrînê dikeve merîyetê. Di heman demê de projeya "Kembera Erebî" di bin navê siyasetên aborî yên sosyalîst de hatin zindîkirin.

Di heman wextê de tevgera siyasî ya Kurd xistin bin zextê. Ji ber nebûna rêveberiyek têgihaştî, ev tevger rastî gelek parçebûn, girtin, terorkirin û îşkenciyan hatin. Desthilatdariya Baas bi van kiryarên xwe yên dijmirovî sînordar nema û bi dagirkerên beşên dîtir ên Kurdistanê re li hev kir; rê da faşîzma Tirkiyê ku derbasî xaka Sûriyê bibe û komkujiyan pêk bîne. Di sersalên Newrozan de ciwanên Kurd dihatin qetilkirin û di jêrzemînên tarî wenda dibûn.

Li herêmên Kurdan ji bilî çandiniyê rê ji karekî din re nedihat dayîn. Çandinî



jî li gorî selika aborî ya desthilatdariya Şamê dihate tayînkirin.

Ciwanên Efrînê di serdema Baas de weke birayên xwe yên li Cizîr û Kobanê, bi hemleyên asîmîleker ên birêxistinkirî re rûbirû man. Ji derveyî xwaringehan ti derfetê karekî din ji van ciwanan re ne dihat dayîn. Tevî ku herêmên Kurdan li Sûriyê xwedî taybetmendiyên stratejîk ên geştiyariyê ne, lê qedexe bû ku seyrangehên mezin ên xwedî stêrk lê bihatana avakirin. Hemû jêderên wê yên ser erd û bin erd bi nepenî dihatin dizîn. Zeyta Efrînê li gorî labuatuwarên navneteweyî yê pispor, xwedî kalîte û pîvanên navdewletî ye, Lê rejîma Baas ew paşguh kiribû û kargehek ku karibe wê zeytê li sûkên derve li ser navê Efrînê bide nasîn venedikir û ne jî destûra wê dida. Li Efrînê ji kargehên sabûn û bêrînê wêdetir tiştek nîn bû.

### Efrîn û Şoreşa Rojava

Rojnamevan Enwer Mûsa ku di pêvajoya şoreşa rojava de di Rojnameya Ronahi de kar dikir, derheqê tekoşin û berxwedana bajarê Efrîn ya di pêvajayê tekoşina azadiya Şoreşa





Rojava de ji me re axift û got, Efrîn tekane herêma ku xwe ji şimitînên aloziya Sûriyê parastî bû.

Li hember aloziya Sûriyê, ji aliyê tevgera azadiya kurd xeta sêyemîn hate hilbijartin. Gelê Efrînê jî ew xet pejirand û bi tevgerek hişmendî ya têgihaştî, hemû heyînên kevin û nû xistin nava seferberiyê vê xetê. Musa li ser vê yekê wiha dibêje: "Ji ber têgihaştina pêşwext, serweriya tevgerên radîkal ên Îxwan Emislimîn û Alqyîde li ser bizava li Sûriyê diyarker bû. Ji lewra ne rejîm û ne jî bizava îxwanan li Efrînê dihatin qebûlkirin. Li vir tinê xeta sêyemîn a xwe dispêre felsefeya Netewa Demokratîk dihat qebûlkirin."

Gelê kurd li ser xeta siyemîn (sistema Netewa Demokratik) xwe bi rêxistin dikir. Di demek kin de meclîs hatin avakirin û hemû pirsgirêkên civakê lê dihatin çareserkirin û valahiyê îdarî bi lez hate dagirtin. Rojnamevan Enwer Mûsa rewşa Efrînê ya di wî pêvajoyî de wiha bi bîr xist: "li seranserî rojava pêşketinên berbiçav aliyên siyasî, civakî û aborî de çê bûn. Derfetên kar zêde bûn, vehesîneke aborî hate jiyankirin, li ser piskirikên hişmaendî hat sekinandin û heya astekê hetin derbaskirin; herwiha pirsgirêkên bermahiyên Baas hatin çareserkirin. Di wî pêvajoyî de rewşa gelê Efrînê nimûne bû".

Enwer rewşa wê demê ya siyasî û parastinê li Efrînê wiha vedibêje: "Aliyê siyasî ve jihevderxistinek hatibû çêkirin. Partiyên aliyê Encumena Niştimanî, veguherîn ENKS'ê û tevlî komên çete yên Tirkiyê bûn û hewldanên wan yên derxistina tevliheviya li Efrînê têk çûn. Gel ji nûve rêveberiya xwe pejirand û tevlî hilbijartinên şaredarî û rêveberiyên xwecihî bû. Bi hevgirtina gel û rêveberiyê, bi tevlîbûna hemû pêkhateyan sîstema xweparastina cewherî li Efrînê jî hat avakirin. Dema mirov li du mehên Berxwedana Serdemê ya li dijî dewleta tirkî ya dagîrker binêre, dizane ku sîstemek parastinê ya çawa li hember teknîka herî pêşketî û duyemîn hêza NATO'yê hatiye avakirin. Ji ber ku sistema parastinê bi gel bixwe hatibû avakirin, gel heya dawî lê xwedî derket û li berxweda."

Enwer Musa gotina xwe wiha domand: "Êdî li Efrînê her tişt li ser koka xwe dihat birêxistinkirin. Ji aliyê çandî lêkolîn û vekolînên gelek mezin û berfireh hatin çêkirin. Kevneşopiya resen ji nav lepên qirkirinê hat xilaskirin. Vê yekê rê li ber azadiya ramanê vekir û bandorek erênî li tora çapemeniya Kurdî û Sûrî kir ku hemû alî bi azadî li ser esasê rêzgirtinê dikarîbûn raman û nerînên xwe parve bikin".

Efrînê aliyê perwerdeya bi zimanê dayîkê pêşengtiya şoreşa ziman a Rojavayê Kurdistanê kiriye ku yekemîn dibistan, peymangeh û zanîngeh li wir hatine vekirin. Li ser vê xalê Enwer got, Çi bermahiyên rejîmê hebûn, hatin avêtin. Jiyan li gorî felsefeya Netewa Demokratîk heta astekê hate sazkirin. Biratiya Gelan li Efrînê wek siloganek nema, kefte jiyanê. Li wan fêrgehan artêşek mamosteyan dihatin amadekirin. Aliyê etnîkî û olî de her kes bi rola avakirina vê sîstemê radibû".

### Çima Efrîn?

Endamê Meclîsa Giştî yê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD Mihemed Emîn Elîko jî di derheqê êriş armanca dagîrkerîya tirkî de axivî û destnîşan kir ku li Tirkiyê rejîmekê hov heye û axiftina xwe wiha domand: "Armanca Tirkiyê têkbirina destkeftiyên Şoreşa 19 Tîrmehê, Biratiya Gelan, hevjiyana azad û veguhestina kirîzên navxweyî bû."

Elîko diyar kir ku dewleta faşîst ya Tirkiyê xwast bi dagîrkirina Efrînê, tekoşîna QSD'ê ya li dijî terora DAIŞ'ê bişkêna û got, dewleta hov ya tirkî tawîz dan Rûsyayê û zext li ser çeteyên li Gûtaya Şamê kir ku di berdêla Efrînê de Gûtayê radestî rejîmê bikin. Mihemed Emîn Elîko gotina xwe wiha bi dawî kir: "Yek ji armancên bingehîn ên êrişên dagîrkirina Efrînê jî, guherîna demografîk û koçberkirina xelkên resen bû.

Dewleta Tirkiyê ya dagîrker bi desteka Rûsya, bêdengiya desthilatdariyê Şamê û çavêxwegirtina koalisyona navneteweyî û Amerîka Efrîn dagîr kir."

Hêjayî gotinê ye ku êrişên dewleta dagirker a Tirkiyê û çeteyên wê li ser Efînê bûn sedema kuştina bi hezaran hemwelatiyan; koçberkirina bi sed hezaran xelkên Efrînê û heya niha talankirin, girtin, revandin, tecevûz, kuştin û dizîna mal û milkên xelkê li ber çavên civaka navdewletî tên kirin.



## Têkoşîna PKK'ê ya zimanê kurdî

**Faruk Sakik**

Piştî şoreşa Şêx Seîd hat têkbirin, di 8 Kanûna 1925'an de, paketa bi navê "plana îslahata rojhilat" hat amadekirin. Ev plan ji 28 xalan pêk dihat. Di xala 14'an de zimanê kurdî hatibû qedexekirin.

Plana Îslahata Rojhilat: Xal 14: "Ew kesên ku bi eslê xwe Tirk'in lê di kurdîtiyê de bi ser neketine û têk çûne, li navendên wilayet û navçeyan, li daîreyên hukumet, beledyayan, dibistan, bazaran û li sazî û dezgehên din de, ji bilî zimanê tirkî biaxivin, wê li gor hukmê muxalefetkirin û serîrakirina li hemberî hukumet û beledyeyan werin cezakirin.

Bi vê yekê jî têr nebûn, di sala 1926an de Kurultaya Ocaxa Tirkan de qedexekirina zimanê kurdî hat gotûbêjkirin. Ji bo asîmlasyonê hin biryarên nû girtin.

Sala 1928'an de kampanya "Vatandaş Türkçe Konuş!" ango 'Hemwelatiyo bi Tirkî biaxive' derket. Ev kampanya li tevahiya Kurdistanê belav kirin.

Bi salan ev planên wan encam jî girt. Lê di sala 1978'an de bi navê PKK tevgerek derket û ev pêvajoya qirkirina ziman û çanda kurdî da seknandin.

Piştî ku di sala 1984'an de şerê çekdarî destpêkir û ev têkoşîn li çar aliyên Kurdistanê belavbû, me hêdî hêdî xebatên rêxistinê yên parastiana ziman û çanda kurdî dîtin. Di despêka salên 90'î de bi avakirina Ensîtutiya Kurdî ya Stenbol destpêkir. Di sala 1992'an de bi derxistina rojnameya Welat dewamkir.

Di sala 1995'an de dema MED Tv dest bi weşanê kir êdî zimanê kurdî yê ku dijmin bi sînoran ji hev dûrxistibû, hat cem hev. Med Tv di dîroka Kurdistan de wek şoreşekê bû. Şoreşa zimanê kurdî bû. Hemû zaravayên kurdî li vê navendê li çar aliyê Kurdistanê û tevhaiya cîhanê belavdibû. Ev têlevizyon li ser daxwaz û hewldanên Rêber Apo hatibû avakirin.

Ji Xurasanê bigre heta Anatolya Navîn, ji Serhedê heta Efrîn, Qamişlo, Hewlêr, Mihabad, Amed û Metrepolan, Kurdan di heman kêliyê de li heman stran û axaftinan guhdar û temaşe kirin. Ev xebatên parastin û pêşvexistina zimanê kurdî bala dijmin jî kişandibû. Ji bo vê pêlê bide seknadin, dewleta Tirk dest bi qedexekirin û girtina van saziyan kir, lê biserneket. Kurd bi biryardarî, heger saziyek bihata girtin yeke nû vedikirin.

Li ser vê yekê dijmin jî dest bi hin politikayên nû kir. Bi avakirina Televizyoneke kurdî dixwest vê eniyê ji kurdan bigire. Li Tirkiyê bi navê TRT 6 têlevizyonek hat vekirin û bi zimanê kurdî dest bi asimlasyonê kirin. Di ekranên vê têlevizyonê de bi kurdî êrişî têkoşîna kurdan a azadiya Kurdistanê kirin. Zimanê Kurdî di vê têlevizyonê de dihat dejenere kirin.

Saziyên parastin û pêşvexistina zimanê kurdî hatin vekirin. Li dadgehan parastina bi zimanê kurdî ket rojevê. 3 dibistanên kurdî hatin vekirin. Şaredariyên di destê kurdan de gelek xizmetên mezin ji bo ziman û çanda kurdî kirin. Lê dewleta Tirk êrişî van xebatan kir û ew destkeftiyên kurdan hemû ji holê rakir.

Dewletê dixwest zimanê kurdî her tim di bin kontrola wê de be. Li ser vê yekê di sala 2009'an de li Mêrdînê zanîngeha Artuklu beşa kurdolojiyê vekir. Hin mamosteyên zimanê kurdî perwerde dikir. Lê piştî ku dît kesên d vê beşê de dest bi xwendinê dikin, li gorî wan tevnagerin, li dijî wan kesan gelek pirsgirêk derxistin. û li Mamosteyên ku weke wan difikirin, digeriyan.

Di van demê dawî de, ji bilî van mamosteyan, hin kes û hin tevgerên bi navê Kurdan ên marjînal jî cîh girtin û dest bi 'kampanya zimanê dersa bijartî' kirin. Di nav civaka kurd de, gelek kes li dijî vê kampanyayê derketin û wek parçeyekî ji siyaseta Erdogan a xapînok pênase kirin. Ji bo pêşî li daxwaza mezin ya zimanê kurdî bibe zimanê fermî ev kampanya dibe asteng.

Kurd di daxwaziya xwe ya 'zimanê kurdî de ku li Tirkiyê bibe zimanê fermî' bi biryar in.



# Êrişên ser Şingalê bi armanca qirkirina civaka Êzîdî tên kirin

Hediya Şemo: "Civaka Êzîdî koka gelê Kurd e û Şingal jî remzeke dîrokî û pîroz e. Ji ber wê parastina wê erkê her Kurdê xwedîşeref û xwedîxîret e."

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Civaka Êzîdî yek ji civakên herî kevnar yên Mezopotamya ye. Mixabin dagîrkerên Kurdistanê li ser vê civakê her dem siyaseta qirkirinê dane meşandin. Ev civak di gelek fermanan re derbas bûye. Fermana dawî Tebaxa 2014'an bi destê ceteyên DAIŞê pêk hat. Dewletên dagîrker yên mîna Tirkiyê bi erişên xwe yên domdar yên ser Şingalê, dixwazin qirkirina çeteyên DAIŞê ya ser civaka Êzîdî temam bikin. Dagîrkerên Kurdistanê bi alikariya PDK'ê ku qaşo xwe hêzeke Kurdistanî bi nav dike, planên qirkirinê li ser gelê Şingalê saz dikin.

Têkildarî êrişên ser Şingalê û siyaseta qirkirinê ya li dijî civaka Êzîdî, berpirsa Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo bi me re axivî.

Hediya diyar kir ku civaka Êzîdî Koka Kurdan e û axaftina xwe wiha domand: "Ji destpêka dîrokê heta roja me ya îro civaka Êzîdî li hemberî fermanan li ber xwe daye. Piştî fermana 2014'an, li dijî siyaseta qirkirinê û komkujiyan, gelê Şingalê bi berxwedana xwe şoreşeke civakî û demokratîk ava kir. Ji bo parastina hebûna xwe jî, civaka Êzîdî xwe bi rêxistin kir"

Hediya di dewama axaftina xwe de da zanîn ku tevî êş û azarên hatîn kişandin, gelê Şingalê hêza jinûavakirina Şingalê bi xwe re dît û wiha got: "Bi pêşengiya Meclisa Xweseriya Demokratîk ya Şingalê, hêzên parastinê hatin avakirin. Ji bo civaka Êzîdî ev şoreşek bû. Bi îradeya xwe ya azad xwe bi rêxistin kir û ji bo ku li herêmê hebûna xwe bidomîne, li çand û dîroka xwe xwedî derket."

### 'PDK û hikumeta Iraqê berpirsên êrişên ser Şingalê ne'

Hediya bal kişand ser hevkariya PDKê ya di êrişên ser Şingalê û amanckirina pêşêngên civaka Êzîdî de û axaftina xwe wiha domand: "Wekî tê zanîn dewletên dagîrker



bi tevayiya hêzên xwe dijminatiya civaka Êzîdî dikin. Kesên 3'yê Tebaxa 2014an civaka Êzîdî bi fermanê re rûbirû hiştîn, niha dixwazin fermanê biencam bikin. Ji ber wê bi awayekî domdar planan saz dikin û pêşengên civaka Êzîdî dikin amanc. Ji her kesî re zelal bûye ku PDK hevkariya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker dike û di êrişên ser civaka Êzîdî de rola wê sereke ye. Hikûmeta Iraqê û rayedarên PDKê berpisên qirkirina civaka Êzîdî ne û wê hesabê komkojiyan ji wan bê xwestin. Ew dixwazin rêveberiya bi xwîna keç û xurtên Êzîdî hatî avakirin, pûç bikin û civaka Êzîdî bê rêxistin bihêlin."

### Gelê li ser fikir û felsefeya Rêber Apo, ji bilî azadiyê tiştekî qebûl nake

Berpirsa Yekîtiya Jinên Êzîdî ya Rojava Hediya Şemo diyar kir ku li dijî fermanan, xweparastin û xwedîderketina li hebûna xwe mafên herî rewa yên civaka Êzîdî ne û axaftina xwe wiha qedand: "Ji nan û avê pirtir pêdiviya Kurdan bi tifaqa neteweyî û avakirina hêza parastina neteweyeyî heye. Herwiha ji civaka Êzîdî tê xwestin ku têkoşîna xwe ya azadiyê bidomîne û destkeftiyên xwe biparêze. Êrişên ser Şingalê û rojavayê Kurdistanê bi heman armancê tên kirin. Dixwazin vîna gelên azadîxwaz bişkînin. Lê wê nikarbin armancên xwe bi dest bixin, lewra gelê li ser fikir û felsefeya Rêber Apo perwerde bûyî, ji bilî azadiyê tiştekî qebûl nake."

# Dewleta tirkî kujera paşrojê ye

**Ronahî-Kobanê**

**Di her êrişê de yên dibin gorî zarok û walatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê ne. Sûcdar û kujer jî dagîrkeriya dewleta tirkî ye. Sûcê dawî wijdana tevayiya mirovayiyê hejand.**

Dewlata tirkî ya faşîst di her êrişa xwe de, çîrokeke biêş di jiyana gelê Kurd de çêdike. Lê di êrişa xwe ya dawî ya ser bajarê Kobanê de, cîhan tev pê êşiya. Ebdo Mistefa Henîfî yê 4 salî yê ji gundê Qeremox yê li rojhilatê bajarê Kobanê, yek ji goriyên êrişên dew-





leta tirkî ya dagîrker e.

Di 8'ê Çilê de, di encama bombebarana dewleta tirkî ya ser bajarê Kobanê de, welatiyê bi navê Îbrahîm Şerîf û zarokê 5 salî Xalid Mistefa yên ji gundê Xanê şehîd bûn. Herwiha 12 kesên din jî birîndar bûn ku 5 ji wan jin û 2 zarok bûn.



Zarokê bi navê Ebdo dema li ber deriyê malê dilîst, bê sûc û bê sedem dewleta tirkî ya faşîst êrişî gundê wan kir. Di encamaê de Ebdo lingê xwe yê rastê ji dest da. Pirsa ku Ebdo dubare dike ev e, Ka Lingê Min?

### Ne Ebdo tenê mexdûrê êrişên dewleta tirkî ye

Berî Ebdo Henîfî gelek zarokên din jî bûbûn goriyên êrişên dewleta tirkî ya faşîst. Yek ji wan keça bi navê Sara ye ku di dema bombebarana dewleta tirkî ya dagîrker ya ser bajarê Qamişlo de lingê xwe ji dest dabû. Herwiha di êrişên ser bajarê Serê Kaniyê de, zarokê bi navê Mihemed Mihemed jî bûbû goriyê çekên kîmyayî ku laşê wî tev şewitîbû û hrwd.

`Tevî van kiryarên li dijî mirovayiyê hê jî hêzên navneteweyî bêdeg in`

Ji bo em rewşa Ebdo ji nêz ve bişopînin rojnameya me serdana Ebdo Henîfî li nexweşxaneya Kobanê kir. Dengê Ebdo li nexweşxaneyê tevê dihat bihîstin û hê digot, Ka Lingê Min? li ser vê gotina wî hêstir ji çavên malbata wî ziwa nedibûn.

Mistefa Henîfî bavê Ebdo Henîfî ji rojnameya me re wiha axivî: "Kurê min çi sûç kiribû ku vê êş û janê bikişîne. Gelo ev wekhevî û edeleta ku cîhan behsa wê dike ka li kû ye. Em li mala xwe bûn, me ti guneh nekiribûn heta ku dewleta tirkî êrişî me bike û bi sûcên xwe paşroja zarokên me tarî bike. Dewleta tirkî li ber çavê cihanê sûcên herî hovane li dijî me dike, lê her kes bibêdeng e û temaşe dike."

Mistefa Henîfî di dawiya axaftina xwe de ji hêzên navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan daxwazî kir ku êdî li hemberî êriş û sûcên dewleta tirkî bêdeng nemînin.

Fener…..



## Bila hîcar bi Efrînkî be

**Idrîs Henan**

Piştî em ji Efrînê derketin û bi zorê hatin sirgûnkirin, em hatin herêma Şehba. Hinek ji me çûn Cizîrê û Kobanê û hinik jî bi qaçaxî çûn Helebê. Ên pir jî li Şehba man. Hinek ge vedigerîn û ge jî hinek derdiketin. Elmuhim; mêjiyê giştikan çeliqîbûn. Kesî nizanî li vir be yan derkeve? Ma, wê çi bike, nema jî, wê çi bike? Lê mesela man û nemanê giştik girêdayî vegerê bû. Yanê yên diman û yên diçûn difikirîn qîcaq û ço vegerin?

Li Şehba sîngên me bê dil mabûn. Zatan aqil bi rê de çûbû û çirtimek jê nemabû. Mesele ne şerek bû em tê de bi ser ketin an bi bin ketibûn. Mesele qutkirina benê navikê bû. Ji bo wî benî jî bi hezaran law û qîzên me şehîd bibûn. Bi qasî wan bi çend caran jî birîndar bibûn. Tiştekî ne hana qola ye em pê nêşin. Li Efrînê li şûn me kêlikên bav û kalan, ciyên zaroktiya me, cade û ziqaqên em lê mezin bibûn sêwî man. Îro li şûn zarokên me hinik xerîb lê dibezin û dilîzin. Bêderên me jî hişk bûne. Cercer lê nagerin û ne jî milêb li ba dibin. Li şûn wan birrek û bîçîxe daran qut dikin.

Tê bê duhu bû! Rind tê bîrê min, em li navenda ecer bûn. Artaq navend vedibiriqî. Siba hevalên me wê bihatana navendê û me yê li wir kar kiriba. Ço me qehwe danî, dengê gompîniyê hat. Saet li dor çara rîbîkêm bû. Me di pencerê re nirî. Çi bibînî çi nebînî? Tenê dengê ureura teyaran di ser me re bû. Aliyê Eşrefiyê jor de kulxan bi ciyekî ketibû? Li ezmanê bajêr dûmanek reş ewrên bi tirs çêdikirin. Me digot qey teqînek an çeteyan topek avêtine? Lê ne wek her carê ye? Me pirsên bi mane û bê mane ji xwe dipirsî, telîfon şixulîn, dijmin û çetên wî êrîş dikin. Esas me zanî rojek hana li pêş me heye. Dijminê me xedar xûnxar, bê wijdan û bê esl e. Çi kiriye jî înan kin!

Ji wê deqê û şûn da jiyanek nû dest pê kir. Artaq her kes li gorî wê dilebitî. Ji zarokên heft salî heta însanê heftê salî di nav istinfarê de bûn. Ro bi ro şênî li bajêr pir dibûn. Xelkên gundan dihatin bajêr û her ro qafîlak şehîdan hebû. Rast e me rojê bostek ax ji dest dida, li yamancê bi dehan xort û qîzên me jî xûn didan. Hana ne qolayî bû. Şervanan sond xaribûn ancaq di ser cinazên me re derbas bibin. Wena bû jî. Tirka çi gotibe jî virr e. Hîn şer li sînor bû, Erdoganê pîs digot wî hezar gundên Efrînê girtiye? Her kes nas dikir ku merîkî virrek e. Wê rojê çiqas rindiyên me hebûn di ber çavên me re diçûn û dihatin. Xêre..? Me bi kê çi kiriye? Wexta DAIŞ û Elnusra berê wan li Ezaz, Marî, Nibul û Zehraa bû, xêncî Efrîniyan kesekî şûn da alîkarî neda. Zarokên me jî di ber wan da şehîd ketin. Hiro jî her yek di aliyê xa da bûye dijminek. Ê êriş kiriye kî ye û yê destav bi kirê daye miletê me kî ye? Tiştek natê jibîrkirin. Wê li xa pişmam bibin. Efrînî ji bîr nakin û yê xa di zikê gur, heftar û maran de nêlin. Tiştê îro zarokên me yên "HRE" dikin hew e. Wê heta rizgariyê jî bikin. Ne çar sal, dehe sal jî herin em ê heyfê hilînin. Ne em bin bila zarokên me bin. Lê bila bi Efrînkî be.